

BABANOELA KURDÎ Û MÎTRA-CEJNA YELDAYÊ:

Baba di warê payeya civakî ya Kurdî de:

Di bîr û baweriya Mîtrayî de çendîn paye û navnîşanên rêberî, olî û bîrmendî hene ku pêşengên civakê bûne weku “Mog, Mag, Magu/o, Pîr, Baba” yd..

Mog, Mag, Magu/o: kesayetî olî û zana û ravekarê olî

Pîr: kesatî fîlosof, bîrmend, rêberê civakê


Baba, Bawe: kesatî olî û civakî di bîr û baweriyên Kurdî de

Rolên mezin dîtine di jiyana û jiyara Kurdî de bi dirêjahiya zêdetirî 5000 hezar salan. Dûre di her sê dînan “Yarsanî, Zerdeştî û Êzîdî” de dîsa payeyên Mîtrayî di her sê dînan şênber bûn û bi taybet di dîne Yarsanî ya Kurdî de kesatîyên pîr mezin hene ku di payeyên “Pîr û Baba”yê de ne bo mînak: “Baba Yadgar, Baba Tahîrê Hûryan(Hemedan), Baba Serheng” yd.. û “Pîr Şalyar, Pîr E-Megrûn, Pîr Weyis” yd.. Ta niha jî pîranî navên der û bajêrên Kurdsitanê bi Pîr û Babayê bi nav bûne weku: “Bawexelan, Bawe, Bawenûr, Baban, Pîremegirûn, Pîrmam, Pîran, Pîrdawud, Pîrzîn, Pîranşehr” yd.. Lê di nav Êzîdiyan de zêdetir peyvên “Baba” û “Şêx”î tê bikaranîn ku peyva “Şêx”î jî peyveke Kurdî ye û ji navê xwedawendê Kasî yan Kaşiyân “Şêxo yan Şîxo”yê tê ku ew jî hozekî Kurdî-Zagrosî bûne û nêzî 5000 salan berê li Zagrosê jiyana e. Ew karîna di çarçoveya Împeratorî yan desthilateke mezin de 3600 sal berê îro, nêzî 400 salan hukimê Zagrso, Mezopotamiya jêrîn û rojhilatên Zagrosê heta Kaşan, Tehran, Mazenderan û derya Kaspîne jî biçin. Li Mîzopotamiyayê jî bo demeke dirêj karîna hukimê bajarê Bablî û Ekediyana jî bikin. Dûre wê peyva “Şêxo, Şîxo”yê kete zimanê Samiyan û di anv de jî erebî her wê peyva “Şemal”ê ku navê xwedawendê çiya bûye di dema Kasî yan Kaşiyana de, lê ew jî kete zimanê Erebi û ereb li dewsa wateya “Bakur”ê bikaranîn. Weku tê zanîn ereb ti carî navê kesatîyên dîni yên xwe nekiriye “Şêx”î, tenê ji mezinên civakê re wê peyvê tê bikaranîn. Mînakên peyva “Şêx” di payeyên dîne Êzîdî de weku “Şêx adî, BabaŞêx” yd.. Helbet her ew rewşa baweriya Kurdî ye ku dûre û piştî hatine dîni Îslamê şêx û rêbazên wê lê bi rengekî îslamî car dî vejîna dibe di terza terîqet, şêx, derwêş/dewrêş, mûrîd, rêşan û tekiyeyan de û her weha navê gelek eşîr û deverên Kurdan bi navê “şêx”î sazmend in weku “Şîxan û Şêxbizênî/bizînî” yd..

Têbînî: her heman “Magu/o”yê Mîtrayî û Kurdî ye ku di nivîsên Yunaniyan de weku “Magos/Magus”ê hatiye nivîsandin û ji ber nebûna dengê “G”ê di zimanê erebi de weku “Mecus”ê bilvê kirin û weku reşkirin û îhane ji kesên ne musulman re “Mecus”î dibêjin

Cejn û şeva Mîtra û Yeldayê:

Cejn û şeva Yeldayê ku di nav Kurdan de weku “şeva j dayikbûna ronahî û Mîtra, şevçile, şeva Mêhr”yê din hatiye derbêj kirin. Dirêjtirîn şeva salê ye û sersala felekî ya Kurdî ye, Dîne Mîtrayî ji aliyê rojhilat gihîşt Hînd, Çîn û Japnê, li bakurê gihîşt Yunan, Ewrope û Brîtaniyayê, li rojava û başûrê jî gihîşt Şam û welatê Misirê. Dîne Mîtrayî ya Kurdî û Zagrosî gihîştibe kû derê, pîrozî û sirûtên xwe jî pêre çûye, li gor lêkoler û tojeran dîne Îsa Mesîd sedî heftêya wê ji dîne Mîtrayî hatiye wergirtin. Yek ji wan sirût û pîroziyan jî, cejn û şeva Mêhr û Mîtra anku Yelda ye. Yek ji taybetmendiyên vê cejn û şevê jî, kesatiya “Baba”yê ye, Baba weku kesatiyeke civakî û mezin di cejn û şeva Yeldayê yan jî Mêhrayê de bi rîyeke spî û nûranî di vê şevê de şîret, serhatî û şîrînî dide amadeyên wê şev û derê. Li van welatên ku me amaje dan, cejn û şeva Yeldayê tên pîroz kirin bi awayên cur bi cur. Ji sedeya yekê zayinê û sedeyên paşîn ku dîne Mîtrayî dîne Ewrope û Împratoriya Romê cejn û şeva Yeldayê di payeyeke mezin de pîroz kirine, lê piştî derketina dîne Îsa Mesîh û belav bûna wê li Ewrope û Împratoriya Romê û dûre qedexekirina dîne Mîtrayî bi taybet di dema Bîzentiyan de û bi fermî kirina dîne Îsayî, serbarê gelek nekokî û gengeşeyên wê demê, lê gotin êdî ji niha û şûnde di şeva Mêhr û ji dayikbûnê de, ew Mîtra nîne ku ji dayik dibe, ew ronahî Îsa Mesîh e û bi vî awayî heman cejn û şeva Mêhr û ronahî yan jî Yeldayê bi sala mîladî 21.12 ya her salê kirin cejn û şeva ji dayikbûna Îsa mesîh. Li gor Încîla Lûqayê beşa 2 deqa 8ê, Îsa Mesîh di havînê de ji dayik bûye. Belge jî ew e ku şivan û gavan li ba keriyên xwe yên pez û garana xwe li der û deştan mane. Lê wek tê zanîn di 25ê meha 12an de tu şivan, gavan, keriyên pez û garan nikare li der û deştan bimîne, ji ber ku hingê pir sar û serma ye. Lê di sala 1691ê de Papa Înasyûs ê 12emîn (Antonio Pignatelli di Spinazzola) roja 1ê çileyê anku 1ê Januaryê kir destpêka sersala nû ya cîhana xirîstiyanan.



Peyva Baba di warê zimanî de:

Di zimanê Sumerî de “Baba” heman wî “Baba yan bab û Bav”ê îro yê Kurdî ye û di hevokeke Sumerî de wî navê durist şêner dibe ku di hevokê wê metnê de zarokê behsa bavê xwe kiriye û dibêje: “BABA/PAPA NUWE” ku em vê hevoka Sumerî bikin Kurdî yê îro tam dibe “Baba/Bavo nuvîstiyê/nivîstiyê” anku “Bavo razayê/xew kiriye/raketiye” hem navê “Baba/Bab/Bav”ê û hem jî lêkera “Nuvîn, Nuvîstin, Nivîsitin”ê di Kurdî de mane û di warê rêzimanî de jî heman û eynen in.

Heman nav û kesatî di zimanê Ewropeyîyan de jî tê dîtin bi awayê “Papa, Pare”yê û rêberê xiristiyanî jî ku îro li Vatîkanê ye, her bi heman navê “Papa-Pape”yê ye anku bavê mezin û mezin ku me li jor jî amaje da, her weha di dîn û baweriyên Kurdî de “Baba” payeyekî mezin dibîne bi taybet di her sê dînen pašmayîyên Mîtrayî anku “Yarsanî, Zerdeştî û Êzîdî”yan de

Baba Noel û koka wê ya Mîtrayî:

Dîsa weku çawa cejn û şeva Mêhr û Yeldayê, Baba jî di heman şev û bi heman nav û heman kesatiyê de weku “Baba Noel”ê di cejn û şeva sersala “Îsa”yî yan jî Krîsmîsê de rol û mîsyona wî tê dîtin bi kinçekî sor ku sembola tavê û kûmeke zirav û dirêjbûyî ye. Rengê sor rengê Mîtrayî û ronahiyê ye di wê şeva Yeldayê de em dibînin mêweyên Henar û

sêva sor yên reng sor tèn bikaranîn li ser sifireya Meyzedê. Di dînê dînê Yarsanî, Zerdeştîyê Êzîdiyê de jî rengê sor simbol û pîrozwerî ye. Ta niha kûmê sor di rewşa “Cemedanî”yê de li serî Êzîdî û Barzaniyan de maye. Berê di nav Kurdan de Tarayê Bûkanî sor bûn, Kincên jinan Sor bûn, kemera bûnkanî sor bûn. Kûmê serê Baba Noelî heman kûmê Mîtrayî ye ew Mîtrayî ku piştî dînê Mîtrayî digihe Yunan û Ewropeyê, ji ber ku pir xwedawendî hebû li Yunan û Ewropeyê, peykerê Mîtrayî jî li gor bîr û baweriyên xwe çêkirin, em dibînin heman kûma serê peykera Mîtra ye ku niha Baba Noelî dixê serê xwe. Her weha diyarî û bexşîn rîşeyeke wê ya Mîtrayî heye û ji mezinan re diyarî bexşîna zarokan weku nîşana dilovanî û bereketê bûye.



Baba Noel yan Santaklos di efsane û çîrokên Ewropeyîyan de:

Santaklos yan Baba Noel di warê mîtolojî û efsanenasiyê de tê gotin ku kesayetiyeke bi xwe, galîska xwe û diyariyan di şeva sersala mîladî de peyda dibe û diyarî ji zaroka re tîne, zarokên jîr û dab şîrînî dide wan û zarokên nejîr û lasar jî tenê kozî dide wan. Vê efsaneyê rîşeyeke wê ya rastî heye ku di sedeya 4 a zayînê de kesayetiyeke bi navê qeşe “Nîkolas” li bajarê “Nîre”ya Yunaniyên kevin de ku niha girêdayî bajarê Antalya ye li Anatolyayê. Piştî dê û bavê wî wefat dikin, serwet û samekê mezin ji wî re dimîne û wî jî bi wê serwetê bi awayekî veşartî alikarî dide gelek malbat û xelkên jar û nedar. Bi taybetî di serhat û bûyerekê deng vedide. Berê di nav çanda Yunaniyan de dema malbat keça xwe didan zewacandin, gerek bû xerciyên wê jî bikin, eger malbatek jar û nedar bûye, dibû keçên xwe weku kole bifiroşin yan jî beden. Pîremêrek ku sê keçên wî hebûn ji ber jar û nedarî nikarî keçên xwe bide xewacandin, qeşe Nîkolas bi vê yekê dizan, şevê bi dizîn ve turikek zêr di kûnê dûmankêşê ve diavêje xwarê û bi vî awayî keça mezin

dizewice û bo keçên du û sê jî bi heman awayî, ta rojekê bavê keçikan di wê kiryarê de qeşe Nîkolas dibîne û vê serhat û mijarê di nav xelkan de belav dibe, êdî ji nişkav û bi dizî diyarî ji kî re bihata, digotin ew diyarî ji qeşe Nîkolasî ve ye. Di serhat û çîrokekê dî de tê gotin ku keştîyeke Îtalî li kenarên deryaya spî de rastî astengî û arîşeyên mezin tîn, hawarên xwe ji qeşe Nîkolas re tînin û qeşe Nîkolas jî dua û lava dike û ew ji vê astengî û arîşeyê rizgar dibin, piştî wê ew ên Îtalî qenciya wî ji bîr nakin û di 1087ê mîladî de hestiyên qeşe Nîkolas bi awayekî veşartî dibin kenaravên bajarê “Barî”yê li Îtalyayê wî binax dikin û dêrekê jêre saz dikin û peykerekê jî li ber dêrê jêra saz dikin bi hêvîya ku bibe xêr û ferr ji bajarê Barîyê. Dîroka mirina wî nayê zanîn lê di dema împrator “Diyuplîtîyanûs” de tê girtin û her di zîndanê de jî wefat dike. Li gor belgeyên dîrokî ew di 6ê dîsêMBERê de û di navbera 345 bo 352ê mîladî de wefat kiriye. Ta niha jî li piraniya welatan û bi taybetî Îtalya û Holanda di 6ê dîsêMBERê de merasîma wefata wî tê lidarxistin.

Guhertina navê “Sant Nîkolas bo santaklos” vedigere sedeya 19ê û çawaniya xwedina navê wî bi zimanê Holandî, dûre wî nav û merasîma wî di navenda sedeya 19ê digihîje Amerîka û belav dibe. Lê berî qeşe Nîkolas jî çîrok û kesatiyên hevterza wî hebûne, bo nimûne li Brîtanya kesatiya “Baba Krîsmîs” hebûye ku di serê salê depeyda bûye û diyarî aniye, li Fransayê kesatiya “Pêrî Noel” û li Alman û Nemsayê kesatiya “Krîs Kayin”, li Amerîka “Krîs Kîngel” hebûne. Lê piştî Holandiyan çîroka qeşe Nîkolas dibin wir, di tevlihevkirina her du kesatiyan de “Santaklos” çê dikin. Helbet hin nerîn hene ku kesatiya tê behs kirin bervajiya wê rast e û kesekî kujer bûye neku bexşinde.



Lêkolîn û Nivîsandin: **Qendîl Şeyxbizînî**